Victorian Equal Opportunity & Human Rights Commission

Mafên te li Victoria û kî dikare alî bike

Mafên mirov

Li Victoria ew yek dijî yasaêye, wekî yek werbêşîyê ji ber nijad, ol, cins, bawerîyên sîyasî û gelek tiştên mayî, dijî te bike. Mafên te yên usan jî hene, çawan mafê ku bêyî parastinê, neheqîyê te nekin, bikaribî daxwezên ola xwe bi cîh bînî û lezetê ji çand û malbeta xwe bibînî.

Ji van re “mafên mirov” dibêjin û li Victoria mafên her kesî wek hevin, tû ku jî ji dayîk bûyî bî.

Werbêşî

Ew usa jî dijî yasaêye ji bo te, eger himberî te bi şêwekî mayîn yan bi neheqî tev bigerin, eger ew li cîhên usan pêk bê, çawan cîhê kar, dema xanî kirê dikî, li dibistanê, li dikan û rêstoranê yan dema sportê dilîzî.

Xelk nikare neheqîyê te bike ji ber:

- rengê çermê te, çand û nijad, bingehê malbetî yan welatê tu jê hatî
- ola te, baweryên olî û çalakî. Bo nimûn, xelk nikare neheqîyê te bike, ji ber ku tu diçî mizgeftê, sînagogê yan kinîsê. Ew jî dikare bibe, wekî tu bawerîyên teye olî tune bin
- kêmendem bûn, nexweşî yan birîn. Bo nimûn, eger tu kêmendem yan nexweş bî, tu dikarê daxweza karekî mayî bikî, bê ku bêyî cezakirinê û karsazê te divêt karekî gor rewşa te ji te re bibîne, wekî tu bikaribî karê xwe bidomînî
- eger tu dêbav yan xemxur bî. Bo nimûn, eger tu xema zara yan endemên malbetê dikşînî, tu dikarî daxweza sihetê cihê ji bo karê xwe bikî, usa, wekî dema te hebe xema zara yan endemên malbetê bikşînî.
- temenê te. Bo nimûn, eger te ji bo kar serî lêxistye, nikarin bêjin tu pir mezinî yan pir biçûkî ji bo wî karî
- tu mêrî yan jinî
- ducanî yan bistan didî. Bo nimûn, tiştekî adîye, tu li şûnên giştî bistan bidî zarê, cawan li qehwe yan cîhên lîstinê, tu dikarî bi xwe bijbêrî, dema ducanîyê yan bistan dayînê, kar bikî yanê na
- çalakîyên cinsî yên gor yasayê. Bo nimûn, ji ber kesê tu pêra dikevî pêwendîyên cinsî, nikarin neheqîyê te bikin.
- alîgirya teye cinsî yan xwenasya rêgazî. Bo nimûn, jin û mêrên nêromê, cotcinshiz, cinsguhêz, rêgezguhêz, nêromê yan cudacinshiz, mafên van gişkan wek hevin
- tu şû kirîyî yanê na. Ew ne giringe tu şûkirîyî, cihê bûyî, ne şûkirîyî yan bi hev re dijîyî, dîsan gerek bi heqî berbirî te bibin
- dîmenê teyî fîzîkî. Bo nimûn, nabe neheqîyê li te bikin ji ber bejn, giranî, mezinayî, por û nîşanên teye zikmakî
- çalakîyên te ji bo mafan li cîhê kar. Bo nimûn, nikarin te ji kar derxin, yan ceza bikin, ji ber ku te pirs dane yan derheqa pirsgirêkên li kar peyivîyî

- çalakîyên sîndîkayî. Bo nimûn, nikarin te ji kar derxin, ji ber ku tu endema(ê) sîndîka pîşesazyêyî yan beşdarî karberdanê dibî
- sîyaseta te, bawerî û çalakîyên sîyasî yan ji ber ku tu başdarî çalakîyên sîyasî nabî.

Ew usa jî dijî yasaêye, eger tu ji ber van sebeban bi şêweyekî mayîn berbirî yekî bibî.

Eger tu zêde malûmatyan ser mafên mirov yan werbêşîyê dixwezî û ka çi dikarî bikî gava pêvîstya te bi alîkaryê hebe, tu dikarî ji Komîsyonê re bi vê hejmarê **1300 292 153** yan ji bo wergerekî bi vê hejmarê **1300 152 494** têlêfon bikî.

Tu nikarî bêyî ceza kirinê, yan neheqî te bê kirin, ji ber ku te alîkarî ji me xwestye yan gilî kirye û tenê kesên bi gilî kirinê ve têkel wê zanibin. Gilî kirin nayê wê wateyê, wekî tu gerek herî mehkemê.

Ji bo zêde agahdaryan tu dikarî usan jî herî vê malperê **humanrightscommission.vic.gov.au** Em usan jî ji bo mafên te li cîhê kar, cîhên civakî û bi dezgehên hukumatê ra, malûmatyên belaş didin.

Victorian Equal Opportunity & Human Rights Commission

Need more information?

Contact the Commission:

Enquiry Line	1300 292 153 or (03) 9032 3583
Fax	1300 891 858
TTY	1300 289 621
Email	enquiries@veohrc.vic.gov.au
Website	humanrightscommission.vic.gov.au

Accessible formats

This publication is available to download from our website at humanrightscommission.vic.gov.au/resources in PDF and RTF. Please contact the Commission if you require other accessible formats.

We welcome your feedback!

Were these resources useful? Easy to use? Would you like to see something else included? Please email us at communications@veohrc.vic.gov.au.

Published by the Victorian Equal Opportunity and Human Rights Commission, Level 3, 204 Lygon Street, Carlton Victoria 3053. May 2013.

Disclaimer: This information is intended as a guide only. It is not a substitute for legal advice.